

### **An alle Bochumer Schulen**

- per E-Mail -

**Der Oberbürgermeister**

**Dezernat IV  
Bildung, Kultur und Sport**  
Rathaus Bochum  
Willy-Brandt-Platz 2-8  
44777 Bochum

**Stadtrat  
Dietmar Dieckmann**

buergersinfo@bochum.de  
www.bochum.de

Datum und Zeichen  
Ihres Schreibens

Mein Zeichen (Bei Antwort  
bitte angeben)

IV

Dienstag, 01.12.2020

### **Rasparde ji bo serederfikirin di gel Koronayê**

Dê û bavên hêja,

petaya koronayê roj bo rojê zehmetiyên nû tîne pêşiya me. Bi vê nivîsarê ez dixwazim çend raspardên pir piraktîk bidim we, da ku jiyana we ya rojane û seredana zarokê/a we bo xwendingehê wek pêdivî were parastin û ewle kirin.

1. Hêviye hûn û zarokên xwe bi cidî van xalan bi cih bînin
  - Di enîşka xwe de bibêhnije (bipişke) an bikuxe.
  - Maskê bikar bîne, li hemû wan cihên daxwaz hetibe kirin.
  - Destên xwe berdewam û têr bi sabûnê bişo (bi kêmî 20 çirkeyan).
  - Li her derê, heta bikarin di nav bera xwe û kesên din de 1,5m bihêlin.
  - Dema silavdan û li hev rasthatinê destên xwe nedin hev.
  - Di vê demê de çî hevalan hembêz nekin.
  - Destên xwe ji rûyê xwe dûr bikin.
2. Hêviye xwe û kesên din biparêzin û haye we ji van şîretên li jêr hebe:
  - **Di vê demê de hevdîtinê bi zêdetir ji malbatekê re nekin!**
  - **Heta ji destên we tê peywendiyên xwe yên taybet sinûrdar bikin!**
  - **Ahengan saz nekin!**
  - **Li dema derketina nîşanên sermayê (kuxik, zekem an ta) neçin xwendingehê an kar!**
  - **Eger ev nîşan bihêz bûn, bi telefonê peywendiyê bi bijîşkî/ê bike!**
  - **Piştî encamdana pişkinîna Koronayê çaverêyî encamê wê bikin û li malê bimînin!**
  - **Eger hûn nexweş bûn an we pişkinînek encamda be, xwendingeh û xwediyê/a kar agahdar bikin!**
  - **Eger encama pişkinîne erênî bû, yekser xwendingehê û xwediyê/a karê xwe agahdar bikin!**
  - **Li dema encama erênî ya koronayê an jî kerantîne bi her halê hebe li malê bimînin!**

Hêviye hûn berdewam bi rêya melpêra **bochum.de/corona** û medyayên din pêzanînan li dor rênmayên nû yên Koronayê bi dest bixin. Hêviye van raspardayan bi cidî werbigrin. Eger em bi hev re pêgîriyê bi van raspardayan bikin, em dê bibin alîkar ku vê petayê nehêlin û pêşkêşkirina dersan li xwendingehê mi-soger bikin.

Pirsên we hene? Ê-mailekê ji buergersinfo@bochum.de re binivîse.

Dietmar Dieckmann



Nûnerê şaredariyê ji bo çand, perwerde û werzişê